



**Hejmar (6)**

**15 Çê Paşî 2013**

**Candî - Giştî - Serbixwe - Nîvmehane ye**



welat.press@gmail.com

[www.facebook.com/Dengekurdistanasurya](https://www.facebook.com/Dengekurdistanasurya)



# Gelo dê zimanê me azad bimîne?

**Aras Yûsiv**

Ji dema ku herêmên kurdî nema di bin desthiladariya rêtîma Esed de man berî her tiştî çavêن miletê Kurd li Sûriyê li zimanê wî bû, hemî partî û saziyên ziman hewl didan ku zimanê xwe yê ku di bin gefa windabûnê de ye vejinin û li her deverê ji herêmên Kurdî li Sûriyê dest bi korsêن ziman bû. Bi rojan re korsan nema têra fêrkirina ziman kirin û zimanê kurdî di riya waneyan de derbasî dibistanê seretayî bû û di destpêka vê sala xwendinê de êdî dest bi perwerdekirina zimanê kurdî di asta navîn de jî hat kirin û plan hene ku ziman di asta amadeyî jî were perwerdekirin. Belkî ev hasten germ di perwerdekirina zimanê zikmakî de li nik ti miletan ji bilî yê kurd ku ji zimanê xwe li ser dirêjahiya dîrokê û sedsalan pê mar me tuneye û ev hest çendîn germ e dema ku li Sûriyê kurdek

fêrî zimanê xwe bibe. Îro û piştî ku zimanê Kurdî hinekî ji nav dîwarêن zindana xwe li Sûriyê derdikeve hêvî heye ku ew bi temamî ji wê zindanê û qedexekirinê der bikeve û nifşen nû yên Kurd li Sûriyê li ser vî zimanî werin perwedekirin. Li her develekê ji cîhanê ziman alava sereke ya têkiliyê ye lê li Sûriyê û li her herêmeke kurdî ev ziman tenê ji bo êşan û kêm jî ji bo kêfî dihat bikaranîn. Hêviya her mirovekî kurd e li Sûriyê ku zimanê kurdî nema vegere rewşa xwe ya berê ku çawa dihat binpêkirin û nifşen nû li ser wî werin perwerdekirin belkî hinekî ji êşa nifşen berê sivik bike dêmek gelek omîdên nifşen kurd ên berî hebnû û di dilê wan de mirin û ji nav wan ku zimanê xwe di dibistan, kargêriyên hikûmî û li ser dîwarêن kolanan bibînin dema ku navê kolanan bi Kurdî werin nivîsandin .



## Kî dixwe û kî dijmêre ..?



Ronî Elî

Kurd dibêjin : "yê ne di şer de, şer pê xweş e" an " yê daran dixwe û yê dijmêre ne wek hevin" ango, yê ne dihundirê bûyer û bêtarê de be nikare bi xweşkayî li ser raweste û şiroveke. Helbet, û li gora vê yekê wê nikaribe çara durist jî jê re bibîne . Ji ber vê jî, îro em dibînin ku ci nêrîn û çarêyên têni diyarkirin ji aliyê ci rêxistin an rewşenbîr bin, ji gelek asteng û kospekê kar û barên me re, cih nagrin û bi ser nakevin, ji ber ne jî hundirê wê têne der, belê ji derva de lê têni mêzekirin. Ji ber ku, roja îro - û piştî ev qas sal - hîn tevgera me neketiye hundirê daxwazên miletê xwe, û hîn rewşenbîrên me jî rola xwa bi duristî nasnekiriye, ji ber vê jî me got: " yê daran dixwê û yê dijmêre ne wek hevin " .

Lê .. kengî wê tevger, rewşenbîr, milet bighêñ hev .

Di baweriya min de, destpêka vê yekê ji naskirina ji hev, ji rola hev, ji erk û pêdiviyê hen re destpêdike. ango divê her yek ji wan erek û perpirsiyariya xwe naske, û sînorêñ xwe derbaz neke, ta karibe bi kar û barêñ xwe rabe, ta her yek ji wan ji a yê din nexwe, û li dawiyê tev ber avêti nebin. Ev birastî kêşa herî mezîn e di hundirê têkliyên me de ye, her yek çaran ji yê din re dibîne, ji ber ne di warê wîde ye, ji ber vê jî ew pêzo ye li serê yê din û bi tev de " BERANIN " . Hema Kurd dibêjin : " Serê du Beranan di Biroşekê de nakelin " .

## Komîteyên Rastiyê

Zuhrab Qado



Komîteyên rastiyê yet ji rîbaz û awayên şopandina rastiyê ne , ew komîte nî lêkolînê ne , demkî û serbxwe ne, lêkolînê di şeweyên zêdegaviyan yên mafê mirovan de dik in. Xebatêñ sereke yên komîteyên rastiyê ev in : şopandina rastiyê û lêkolîna li zêdegaviyan û belgekirina wan , pêşkêşkirina raspartinan bo xurtkirin û bicikirina aştiyê.

Jibo ku komîte serkeftî be divabe hin mercin serke pêk bîn e mîna : avakirina rewayetiya komîteyê û ew jî bi rêya rawêjiya bi gel re , zelalkirina pergal û mijarêñ komîteyê , hilbijartina karmendin rûspî û nealîgir , peydakirina dahatiyan û piştgîriya aborî , amedekirina rapora dawîn .

Pergal û maijara komîteyê :

di serî de divabe mebest û armancêñ komîteyê bêne xuyakirin û ligorî wê nav ,kar û xebatêñ komîteyê bêne bicikirin ,û cûreyên zêdegaviyan ( şopandina zêdegaviyên mafê mirovan di dema hevrikiya siyasî de yan xurtkirna bingehêñ pêkvejiyana aştiyane û rêzgirtina li mafê mirovan) û " di kîjan demê de" bûn mîna li mexribê di navbera sala 1965 ta 1999 an de, destnîşan bik e, û çiqas dem gereke ji komîteyê re ku van xebatan bişopîn e û bidawî bik e.

Bêguman komîte liser bingehêke yasayê saz dib e . dibe ku di nava peymaneke aştiyê yan fermannameyekê de were pêşkêşkirin , mîna zagona xurtkirina hevgirtina niştîmanî û aştîbûnê li Başûrê Afrîkayê di sala (1995)an de, yan jî bi rêya fermannameyeke komarê wekû li çîlîyê di sala 2003 yan de û li hin dewletin din jî. Endamên komîteyê :


Endamên komîteyê xwedan bandoreke mezinin li raspartinê ku komîte der tînin , lewra bawereya cemawer bi endaman rewayeteyê dide komîteya şopandina rastiyê . jiwiyo divabe kesin hezkirî û cihê baweriye û nealîgir û ji gelek bire û ren-garengî civakê werne hilbijartin bo endametiya komîteya şopandina rastiyê . dibe ku endam ji hêla serokkomar yan desteyeke navdewletî werne bicikirin ( li Xana û Arcantîna yê serokkomar ew bû yê ku endamên komîteyê bicikirin lê li gwaîmalayê razgirê giştî yê neteweyên yekbûyî bi vî karî rabibû ) . endam dibe ku ji welatiyên wî welañ bin yan endam in navdewletî bin jî ( li Xana di sala 2002 wan de hemû endam ji welat bûn , li Başûrê Afrîkayê di sala 1995 an de 2 ji 17 e yan endam in navdewletî bûn lê li Silvadorê di sala 1991ê de endam bi tevayî navdewletî bûn ). Li kêleka komîteyê komek ji pisporin cobecor hene ( pisporêñ mafê mirovan , yên yasayê , lêkolînerên di warê civaknasî û derûnnasiyê de , wergêr û pisporêñ koputer , rêvebirî û karmendêñ ewlekariyê û bêguman hebûna jinan gelek jinan handêr dike ku baxiv in .

Dahatî û deselatdarî :

Dahatî roleke sereke di şêwe û rîbazên kar û xebata şopandinê ya komîteyê de dik e . ger dahatî hindik bin dibe ku xebatêñ komîteyê biherifin û bi cih neyên û berovajî wê rast e, dema ku deselatiya komîteyê hebe ku bigihê gelek belgeyan yan bîryaran derheqê ziyanbaran de yan jî mafê parastina dîdevana bik e , ew bixwe şêweyek ji şêweyên xurtkirina karê komîteyê ye ( komîteya şopandina rastiyê û aştîbûnê li başûrê afrîkayê "lêborîna merckirî" yet ji girîngirîñ deselatiyên wê bûn .



## Koçberiya Ewropayê



Welat

Gelek caran mirov didît ku xortên Kurd ji herêmên xwe derdiketin ber bi bajarên din ên Sûriyê ve bi mebesta kar.ji ber ku herêmên Kurdî di Sûriyê de kar tê de pir kêm bû.û siyasetên rîjîmê yên nijadperest hiştibû ku ew di belengazî û perîşaniyekê bê sînor bijî. Û piştî destpêka şoreşa Sûriyê,hemû bajar di şer û cengê de ne .û ji wê êdî nema kes ji xortên Kurd ên ku li wan kardikirin dikarîbûn bimînin û bigîşî jî tev vege riyan herêmên xwe.

Lê dest bi koçberiya ber bi Tirkiyê û Ewropayê ve kirin.belkî li wir jiyan eke xweştir û bi rûmet bibînin.

Diyardeya koçberiya ber bi Ewropayê ve gelek sedemên xwe jî hene, ya sereke ew e belengazî,û sedemin din hene wek

xwendinê,siyaset,tenduristî...hwd..

Xortên Kurd ên ku Ewropa ji wan re xewin bû,ew in ên ku baweriya wan bi hebûna wan li ser axa xwe nayê wek miletteke resen û li welatê xwe jiyan dike. Ji wê dema ku derfet di dest wan diket yekser berê xwe didan Qaçaxçıyan û ewan jî berê wan didan buhiştê ,li gorî nerîna wan...

Bawerî ne ev e, bawerî ku mirov li welatê xwe bijî, çi di xweşiyê de, û çi di şahiyê de.û bitaybetî jî ciwan. Ji ber ku ew in ên ku welatan ava dikan.

Û weke ku tête zanîn: ciwan bingeha pêşerojê ne.

### Rola xwendevanê zanokyê di civakê de

Mehmûd Badilî

Her mirovek di jiyanê de roleke wî heye, dibe ku mirov bêtirî rolekê bilîze, ji xwe her rolek erk û pêdiviyêne wê peyda dibil, weku rola dayikê, ya bav, ya mamosta, ya xwendevan, ya nivîskar..td, û hestê spartina derbarî roleke taybet û kar û stûbariya di ber de bi wateyeke berfireh em dikarin navê berpirsyarî lê bikin, û xwediyê wê bi navê kesê berpirsyar.

**Berpirsyarî:** berpirsyarî tê bi wateya ew mirovê ku dikare bi xwe hest bibe û danûstandinê bike, û ev yek bi serbestî û bîrweriyê ve girêdayiye, mirovê bîrwer dikare biryaren xwe derbarî tiştan de bide, tiştê rast û şaş ji hev nas bike.

**Xwendevan:** ew kesê ku dixwaze zanînê bi dest xwe bixe, û bi rola xwe derbarî xwe û civaka xwe rabe, ew stûna piroseye perwerdeyî ye.

**Zanko:** dezgeheke zanistî – perwerdeyî û fêrwerî- lêkolîner û wirarî û serkêşîye di civakê de, dezgeheke komelayetiye derbarî belavkirina bînerên azadî û dadî û wekheviyê di rîya fêrbûn û lêkolînê re.

**Berpirsyariya xwendevanê zankoyê di civakê de:**

- 1- destxistina xwendinê: ev berpirsyarî bi pêk tê ligorî bîrwerî û têgihiştina yê xwendevan..
- 2- çalakiyên rewşenbîrî...
- 3- avakirina kesayetiyê: ji hêla rewşenbîrî, ramanî û zanistî, li vir yê xwendevan riya xwe hildibijêre û nîşaneyên pêşeroja xwe desnîşan dike. xwendevanê serkeftî xwedî hedan û arame, çalake, bo rastiyê digere û vedikole, bîrwere, nirxê hiş û hismendiyê dizane.
- 4- bîrweriya welatparêzî, û hilgirtina ramana mirovantiyê.
- 5- xizmet û beşadrî di hişyariya civakê de.
- 6- kar û bebat di ber yekîtiyê de.
- 7- berevanî di ber welêt de.

û taku xwendevanê zankoyê bibe rewşenbîr. jê tê xwestin ku di warê rewşenbîriyê de li sê aliyan raweste:

A- rewşenbîriya zanînî. B- rewşenbîriya kiryarî . C- rewşenbîriya siyasî.

divê em bidin xuyakirin ku, em di aloziyekê de derbas dibil, ev li ber çava ye, û ji her kesên bîrwer xuya ye, û taku em nebin beşek ji aloziyê, divê ku em danûstandinê bi xwe re bikin ku em kencin komelayetîne, em li ber berpirsyariyên xwe bisekinin, û bi çavekî vekirî li qonaxê û guhertinêne wê binerin, divê ku yê xwendevan xwedî bandor be di vê yekê de, baş rewşa xwe û rewşa civaka xwe bixwîne, divê ku di warê zanînî de bigere û li nava rewşenbîriya xwe û ya xelkên dîtir jî, li vir divê ku dûrî xweçepandinê here, divê ku bixwîne, bipeyive, beşdariyê bike, rexneyan bike, hevpeyvînê bike û alîkariyê bike, taku em bi hev re welitekî serfiraz û azad, û milete pêşketî, xwedî şaristan li ser bingehin rast û durist ava bikin.



Sînemeya Amûde li Qamişloye dihe bibranîn



## Îmad Talatî

di salvegera 53yan de ya şewtandina sînemya Amûdê de,hin çalakî ki Qamişloyê hatine lidarxistin.

Weku tête zanîn di sala 1960î de sîneme bi şêwazeke hovane ji hêla desthilatdaiya Komara Hevgirtî ango(El Cumhûriye El Mutehîde) ve hate şewitandin û di encama wê de bêhtir ji 200 zarokên Amûdê jiyana xwe ji dest dan, tevî ku ew çibûn sînemeyê bi pereyên xwe ji bo piştgirtiya şoreşa Cezayirê di wê demê de.

Hevgirtina Xwendekarên Kurd li Sûriyê şevbuhêrkek lidarxist,û di wê de şanoyeke li ser vê bûyerê hate pêşkêşkirin, tevî helbest û axiftinan.

Tevgera Gelê Kurd û li navenda Cîgerxwîn a çand û hunerê Filmekê Dekyûmenterî li ser şewata sînemeyê pêşkêşkirin. Û hin helbestvan jî helbestên xwe xwendin li ser vû bûyerâ biêş û xemgîn.

Ji hêla xwe ve jî girûpa Sînema Film şevbuhêrkek lidarxistin bi filmeke ji derhêhana Şêro Hindê û di film de şewata sînemeyê ji hêla mirovekî ku di sînemeyê de bû û ew ji mirinê xilas bibû hate şirovekîn.

Û di aynî şevbuhêrkê de Girûpa Arta ya mûzîkê jî buyer bi bîr anîn bi çend parçeyên mûzîkî.

Herwiha Şêro hindê,Derhênerê film wisa ji me re axift:

Me çalakî lidrxist jib o bîranîna ew bûyerâ xemgîn ku ew ê dê her û her di bîraweriya me de bimîne.

Ji hêla xwe ve jî Ronas Şêxmûs ,Bilûrjen û endameke di Artayê de got:

Me hin parçeyên mûzîkê pêşkêşkirin ji mêvanên besdarbûn re ji êş û şewata dilê xwe bi xemgînî ku çawa ew zarok bi awayeke hovane hatine şewtandin ,û ez bawer im ku tenê mûzik dikare giyanên zarokên Amûdê şâ bike.

Giyanên zarokên ku di sînemeya Amûdê de şewitîn her û her di bîraweriya Kurdan de sax in, û ew ê dê bimînin navnîşana zikreşîya kesen nijadperest.



Zarokên Sînemeya Amûdê

## “Maratona Aştiyê “

“Gav bi gav ber aştiyê ve ”dibin vê navnîşanê Hemahîngya Ciwanên Sewa bi Maratoneke ji bo belavkirina aştiyê li bajarê Qamişloyê rabibû, di roja 1/11 /2013 an de, rehabûna wê ji Parka Al Kindî li kolana Qûwtelî dest-pêkir û ta bi kolana Mûnîr Hebîb li taxa Xerbî ,bi besdarbûyîna hejmareke mezin ji Kurd, Ereb û gelek pêkhatiyên din yên bajêr. û gelek kesayetî wek siyaset-medar û rewşenbîr. Mercê pêşbirka Maratonê ku 3ê xort û 3ê keç u 3ê zarok yên ku pêşî bighêw ew ê dê biserkevin , pêşbirka awayekî berfireh û geş berde-wam kir, kesen serkeftî ji hêl rêvebirya Mara tonê ve hatin xelatkîrin, herwiha endama hemahîngya ciwanên sewa”Gulbuhar Mihemed”ji welat re axift û got : Piştî ku şoreşa Sûryê ber bi tîrayîyê ve diçe,wek hemahîngya ciwanên sewa me dît ku Karêن sivîl bandora wan behtir li ser civaka sûriyê heye, herwiha me xwest ku em hezkirinê di nav pêkhatiyên Qamişloyê de zêde bikin,armanc ew e ku Çanda aştiyê belav bibe , di nerîna min de Maraton biserket,û kesen besdarî wê bibûn ev tişt xweş dîtin. Muhened Mitlig ê asteya yekemîn girt ji nav xortan wisa ji me re axift : Ez vê serkeftina xwe diyarî rahênan û mamostayê xwe dikim,û kêfxweş im bi çalakiyeke wisa bîna biratî û aştî di wê de diyar e. Herêmên Kurdî li Sûryê xebatêن xwe didomînin û Maraton Çalakiyeke nû ye, hêvî ji wê heye ku bibe simbola jiyanike hebeş di nav hemû pêkhatiyên Sûryê de bi şêweyeke aştiyane .

Xunav Kano





## Da jiyan berdewam be..... milet divegerê alavên kevin

Di dîroka miletê Kurd de herdem zehmetî û alozî ji wî re peyda dibûn lê ew jî dikarîbû xwe xilas bike ji hemû aloziyan.îro em dibînin ku kehrebe peyda nabe bi awayeke berfireh ji wê dîsa çira,fanûs,lempe hwd....bikardihêن û di pêwariya xazê de jî dîsa Bapor li tevahiya malên Girkê Legê peyda dibe. û vekirina gelek aşen genim di herêma GIRKÊ- LEGÊ de wek aşê gundê KÊŞKÊ li bakurê bajêr aniha pêdiviyekê sereke ye ji bo xelkên bajêr û gundênderdora wî,piştî 13e salan ji girtina wî.

Herwiha xwedanê aş FEWAZ ŞATIR ji me re axift: di sala 1952an de aş hate avakirin û karê xwe berdawam kir ta sala 2000 hate girtin piştî milet nema hewcedarê wî bû.

Lê aniha jî dîsa vekirina wî gerek bû ji xelkê re. Ji bilî aş milet divegerê gelek alavên kevin wek mûmeyan, gazê û çêkirina xwarinê li ser agirê daran û baporan . her weku jinekê ji Welat re axift: tunebûna XAZÊ em dîsa vegrandin baporan piştî demeke dirêj me bapor hilanibûn û me avêtibûn, me çû disa kirîn bi buhayeke giran.

Weke tête zanîn buhayê bapora gazê gihiştiye 4000 leyreya Sûrî li bazara Girkê Legê..

Herwiha zehmatiya jîyana milet li herêmên Kurdi bitevahî zehmetiy in rojane ne. Lê tevî wê jî milet bi vîna xwe jîyana xwe berdewam dike ..

### Gulal liyanî – girkê legê



## Sala nû ya xwendinê û aloziyên wê

### Welat-Tirbêspiyê



Dîsa sala nû ya xwendinê destpêkir û şagirtên li dibistanan li bajarê Tirbêspiyê gelek pêdiviyên xwe jî hene ,lê mixabin bi dest nakevin.

Buhayîya pêdiviyên sereke yên

xwendinê(pênuş,lênûş,çente,cil û bergên dibistanê...hwd..)

Sedem in ji neçariya wan re û çûyîna wan li dibistanê bi dileke xemgîn.

Tevî hin tiştên din jî hene ku ew bi wan dilsar dixin ji xwendinê re,wek gelek ji hevalên xwe nabînin ji ber ku ew bi malên xwe re koçkiribûn û aniha jî ne heneş in bi wan re di dibistanê de.

Û ew şerên ku li derdora bajêr dixin û dengê bombeyan û çîrokên kuştin û xwînê hemû sedem in ji metirsiyên wan re û bi wan mijûl dixin û êdî ji rewşa xwendinê dûr dikevin.

Û li ji bo vê mijarê bitayebetî jî gereke ku kesên bispor bi rola xwe rabin û çareyekê ji vê pirisgirêkê re bibînin.

Girîg e ku her kes bi erkêن

xwe rabin û alîkar bin ji şagirtên dibistanan re ,ji ber eger rewşa wan wisa bimîne ew ê dê bi şêwazeke ne durist mezin bibin û dê nexwende bimînin



## Rewşa fêrkirinê li bajarê Serê Kaniyê



Di destpêka sala xwendinê ya nû de , bajarê Serê Kaniyê gelek astengiyan dikşîne di ware fêrkirinê de .

Serê Kaniyê tevlî gundên rojhila tî yên ku bi wê ve girêdayîne , di rewşeke hêmenî derbasdibe

Di serdana me li çend dibistanan bajêr de û dîtina me ji hejmarek mamosteyan re , ji (Welat) re tekez kirin ku gelek astengî û kîmasî li hemberî vekirina dibistanan heye , ji ber kîmbûn û nebûna girûpêñ fêrkirinê (mamosta , kardar û rêvebiran). û ji hêleke din ve dizî û wêrankirina ku li dibistanan hatiye ajotin bi destê komên biyanî ji bajêr , û hin kesên wêranxwaz .

Diyare ku rewşa li bajêr bûye ji berya deh mehan ta vê gavê û koçkirina piriya welatiyan , hişt ku hejmara şagirtan kêm bibe bi hemû astêñ xwendinê de . lê tevlî wilo jî li gorî hejmara welatiyan yên li bajêr , hejmara şagirtan başe.

Û ev hejmar bêhtir dibe , nemaze piştî vegera gelek malbatan û serotara pir ji dibistanan li Serê Kaniyê .

Û çareyên pêşinyarkirî li gorî nerînê mamosteyan ev bûn:

1 – Damezrandina desteyek fêrkirinê ji mamosteyen bajêr yên jîr , û ji hemû mozayîkê bajêr .

2 – Peydakirina pêdawîstêñ karê fêrkirinê bi besdariya desteya pêşinyarkirî û saziya perwerdeyê û saziya zimanê kurdî .

Û di dawiya gotina mamosteyan bi (Welat) re , bangek şandin bo hemû mamosteyen bajêr û bi taybetî yên ji Serê Kaniyê bo alîkar bin di başkirin û bilindkirina asteya rewşa fêrkirinê li bajêr .

Kalid şêxo

## Aştiya Navxweyî

Welat-Hesekê



Encûmana aştiyane a gelêrî li bajarê Hesekê Dilzar - Hesekê Bajarê Hesekê wekû hemû bajarêñ sûriyê astengî têde çêbûn di vê şoreşê de, hin jiyanî bûn û hin ewlekari bûn û pirê wan bi destê rijêmê bûn, ji ber wî hawî û ji ber taïbetiya bajarê Hesekê û hebûna aşûr û ereb û siryan li nav birayêñ xweyî kurd, divabû dest bi dest tevde amade bin ji bo astengiyan nehêlin û aramîyê li bajar bi cih bikin. Piştî xebat û karê çend heyva ku rûniştinêñ hevbeş di nav gelek hêzên siyasî û civakî de çêbûn ji aşûr û ereb û siryan û kurd mîna encûmana niştimanî ya kurd û encûmana gel ya rojavayê Kurdistan û rêxistina aşûr ya dimuqrat û yekîtiya siryan û partiya gel û tecemuaa erebî û heyet el tensîq û kutla niştimanî sûrî û hin serbixwe, ev tevde bi nerînek hevbeş derketin ku Encûmana aştiyane a gelêrî li bajarê Hesekê li darxin û gavek avêtin di vî warî de û komîtek avakirin bi navê komîta şopandina aştiyana gelêrî li bajarê Hesekê û karê vê komîtê wê rojane bi û dema astengî hebin, û di vî warî de dîtinek me hebû bi Mistefa bavê helebça re endamê komîta şopandina aştiyana gelêrî li bajarê Hesekê û ji mere got: Girîngiya damezrandina Encûmana aştiyane a gelêrî li bajarê Hesekê pêwîste di vê qonaxa em têde derbas dibin, sî meh ji şoreşa azadî û rûmetê li sûriyê berdewame pir zehmetî û astengî li devera me çêbûbû, valabûna bajarê me ji hêzên ewlekariyê, pir kes hebûn yên dixwestin şerekî navxweyî di bajarê me de li darxin lê me karîbû wek encûmana niştimanî ya kurd hevgirêdana me xebatin rojane me berdewam kir bi aşûr û ereb û siryan û hevalên partiya pyd me karîbû komîta şopandina aştiyana gelêrî li bajarê Hesekê li darxista. Ev rewşa em têde derbas dibin ji kuştinê û revandinê û bihevçûnê û teqandinê û birçîbûnê tevde li devere me çêbûye lê me karîbû bi vê hevgirtin û hismendiya xwe bihişa aramî li devera me berdewam bikra di demekê de ku rijêma sûrî daxwaziya wê û xebata wê ji bo tevliheviyê û kuştina navxweyê li bajarê me çêbike lê me karî bû bi karêxwe yê hevbeş nehişa ev tişt pêkbê pêwîste jiyana hevbeş di vî bajarî de û ev aramî giringe ku berdewam be di devera me kurda de. Her wiha dîtinek tir hebû bi Zeya werda bavê somer re endamê komîta şopandina aştiyana gelêrî li bajarê Hesekê û ji mere got: Girêdana xelkê deverekê bi hevre dihêle aramî di wê deverê de bicî bibe, û çi astengî hebin wê nemînin, piştî kîmasiyê hêzên ewlekariyê di bajarê me de û pirbûna birçîbûnê û tirsê û diyê û derketina eşen nû ku xerîbin li ser milletê me wekû revandina ji bo pera û girtina li ser nasnama, û ji bo vî hawî em wekû hêzên siyasî û civakî piştî civatin hêja em bi hevre gihan biryara girêdana Encûmana aştiyane a gelêrî li bajarê Hesekê, û me komîta şopandînê jê çêkir, û jîvatêñ me wê berdewam bin ji bo welatiyêñ me koçbar nebin û bi aramî jiyana xwe bibînin.



## Dunya Sîno.. kulîlka Dirbêsiyê hate binaxkirin

Bajarê Dirbêsiyê di roja 29 / 10 / 2013 an de bi agahiyeke xemgîn hestbibû û şînî kete dilê xelkên bajêr dema ku bihîztin ku keça bajarê wan Dunya Sîno jiyana xwe ji dest dabû.

Dunya di sala 1995an jidayik bibû û ew ê xwendina xwe li Zanîngeha Ferat li bajarê Heskê dikir, beşê Endazyariya Şaristanî, sala yekemîn.û di encama şerekî de di navbera hézên ewlekariya rîcîmê û hin çekdaran de li pêşıya zanîngehê guleyek li serê wê ketibû û jiyana xwe ji dest dabû.

Xelkên Dirbêsiyê û bi beşdarbûyîna gelek kesayetiyêni siyasî ji serkirdeyêni hin partiyêni



Kurdî û rewşenbîr û nivîskar kulîlka xwe ber bi gundê Gir Kund ve birin û li wir ew ê binaxkirin ,bi girî û lorandinan li ser giyanê wê yê pak û ciwan ku çawa bû qurbanîya şerkî gemar û bê sedem ronahiya çavên wê hate vemirandin.

Solîn Dewîş, hevala Dunya kela girî di qirika wê de û ji Welat re axift:

Dunya hevala min bû ji dema zarotiya me de,û hêj sala yekemîn bû û bi xwendina xwe şâ nebîbû

Ezê dê gelakî bêriya wê bikim, min ji wê pir hezdîk....

Û nema dikaribû peyya xwe berdewam bike ji ber girî û êşa dilê wê .

Asîmaneke reş bû bi ser bajarê Dirbêsiyê de di roja koçkirina Dunya ji cîhanê, û ew ê dê bimîne di bîraweriya hevalêni xwe û xelkên bajêr bitevahî de wek pakrewana zanînê.

---

Seidûn El Sîno



## Rola Jina Kurd di şoreşan de

di civaka Sûryê de ,wek sercem komelgehêne rojhîlatî , bi çavekî biçûk li jinê dihat nerîn,û dihat gotin:ku erkê jinê tenê ,perwerdekirina zarokan ,û amadekirina xwarinê ye.û gelek kesên oldar,xwedî nerînê teng jî , digotin: ku cihê wê yê xwezayî, mala wêye .

Lê piştî ku şoreşa rûmetê li Sûrê vêket,gelek boçûnên şâş derbarî jinê ve hatin guhertin.û jina Sûrî ,û bi taybetî ya Kurd.ji civakê re tekez kir , ku cihê wê ne tenê di navbera çar dîwaran de ye ,û karê wê ne tenê paqîjkirina malê ,û perwerdekirina zarokan e.

Lê ew dikare mil bi mil bi mîran re dakeve kolanan,û beşdarî xwepêşandanîn jî bike, û bi tanahiya xwe jî dikare , rîbertiya mîletekî bike.

Du sal û nîv ji temenê şoreşê derbasbûne,di vê dema dirêj de,jina Sûrî gelek xem û azar kişand , ji ber: kuştina kurekî ,yan binçavkirina hevserekî,yan dûrketina xweştiyiékî,lê wê ci caran xwe radestî neçariyê nedikir,û serê xwe ne diçimand.

Ciyawaz ji jina Sûrî bi giştî ,jina Kurd wajoya wê ya taybet di vê şoreşê de hebû,ji ber ku ew xwedî ezmûneke mêmûyî ye di jiyana şoreşgerî de, û ji mêj ve rola wê ya giring di civaka Kurdî de hebû. Lewra ew bêhtir aktiv bû di nava şoreşê de.

Dayka Civan ,yekbû ji wan jinên kurd li bajarê Amûdê , ku çalak bû di vê şoreşê de,û herdem beşdarî xwepêşandanîn dibû.

Bi cilê xwe yê Kurdî,û bi dengê xwe yê naz banga azadiyê dikir,herwiha bi rîya siloganîn xwe,û çalakyên xwenyên sivil, dixwest ku bergiriya mafê jinê jî bike.

.derbarê pirsa ku me jê kir sebaret bi rola jina kurd di şoreşê de ,wiha axift: bêguman jina Kurd di civakê de ta radeyekî baş mafê xwe bi dest xistiye,û ew serbest e,lewra rola wê jî aktiv bû di şoreşê de ,û xwedî biryar bû,berevajî ku hin kesan hewl didan ,ku wê wek qurbanîykê pêşan bidin..

-Dayka Civan, tenê nimûneyek bû ,û bi hezaran ji jinê din weke wê di civaka Kurdî de hene, lewra em piştrast in ku di Sûryâ nû de êdî tu kes nikare mafê jinê binpê bike,û ew ê dê roleke sereke jî di navenda girtina biryarê de bistîne.

**Mihemed Alûcî- Amûdê**



## Dêrik û komên Gemarê



Bajarê Dêrikê . Mehmûd Şahîn

- Gemar û pîsayetî gelek nexweşîyan çêdikin û rengeke ne xweşik dide bajarêni mirov. Gemar û qirêj ne dîmenên pêşketîn e.

Lê bêguman hûn tev dizanin di vê qunaxa dawî de li Sûryê gelek xirabûn, talankirin, wêrankirin û şewitandin çêbibû û sedemên van aloziyan pêwariya kesên berpirsiyar .

Ji destpêka şoreşa Sûryê ve û gelek karêni xizmetguzariyê hatibûn rawestandin, ji wan karêni şaredariyan.

Şaredariya Dêrikê jî yek ji wan bajarêni ku ji demeke dirêj ve komên gemar û qirêjê tê de çêdibin û zêde dibin, û ji berî şoreşê ve jî bajar gelekî bê guhdan bû ji hemî aliyan ve û bitayebetî ji aliyê şaredariyê ve ta anîha jî gelek tarêni bajêr xetê rîgarê û yê karêzê ne danîne .

Lê herwiha ne ev gemar bitena xwe roleke neyinî heye , dûmana tirumbêlan ewjî roleke neyinî li rewşa jîngehê dike, û dibe sedem ji gelek nexweşîyan re.

Derbarê vê rewşê Dr. Mehcûb Merî ji Welat re wisa axift :

Komên gemar û qirêjê li bajarê Dêrikê zêde dibin û dûmana turimbêla dibine sedem ji van nexweşîyan re wek :

Aloq – Alyayî – berheng – Bêñvedana teng – Axîrî – Amasî – Serêseka zûr – Kêmasîya dil – Penceşêra roviya – Cerge kal – Zik cûn – û gelek nexweşîyen din jî . û ez dixwazim di rîya Kovara we bang li hemû kesî bikim ku haj ji vê diyardeya neyinî hebin û çareyekê lezgîn ji wê re bibînin.

Paqîjiya çi bajarekî navnîşana şaristaniya wî ye. û gereke mirov li bajarê xwe xwedî derkeve.

## Zarokêni Kobanê û pariya nan a ji Ziblê



Di vê rewşa dijwar de ya ku herêma Kobanê di wê de derbas-dibe, bitaybetî jî rweşa aborî, gelek ji zarokêni bajêr neçar dest ji dibistana berdan û berê xwe dabûn kar da bikaribin alîkariya bavêni xwe bikin di peydakirina xwarin û vexwarinê. Lê mixabin gelek ji wn tu rê ji kar re nedîtin ji bilî ku berê xwe bidin zibaleyen .

Û her sibeh tu dikare gelek zarokan li ser komên wan ziblan bibîne ku çawa di nav wê gemarê de li tiştekî ji bo xwarinê yan jî tiştekî bibînin ku bikaribin bifroşin û bi wê xwarinê bikirin ji mala xwe re.

An ew li lastîkan digerin an jî li qutiyêni vala da kom bikin û bifroşin li bazara bajêr bi buhayiya 1500 ta bi 2500 leyreya Sûrî.

Me dikarîbû hin ji wan zarokan bibînin û wisa ji me re axiftin: Mistefa Xelîl(11 salî ye) dibêje: em ji Reqayê ne, û em hatin Kobanê piştî ku şer li bajarê me giran bibû.tu kar tune ye ku em bikin ji bilî vê ziblê û em bilastîkan dicivînin û em kîlwa wê bi 40 lereya Sûrî difiroşin.

Mehmûd Xelîl(12 salî ye) dibêje:

Em li Şamê bûn, û dema ku taxa me topbarankirin, neçar em ji wê derketin û em vegeyîan Kobanê, birayê min di zindana rîcîmê de ye, û ez dixwazim alîkariya bavê xwe bikim, ji wê ez naçim dibistanê û vî karî dikim.

Hêja ye gotinê ku jimara zarokêni ku li ser zibaleyen peyda dibilin ji 300 ta bi 400 zarokî ne rojane.

Welat Bekir- Kobanê



# Pirtûk

Tengîzar Marînî

Ji hêla fizikî ve, pirtûk, kaxezên li ser nivîs hatiye belavkirin û di qewarê bergekî, an jî bendekî de ye, li gor pênasîna (UNESCO-pêdivî ye, nekêmtir ji 49 rûpelan be) Funksiyona pirtûkê, wan nîşanên grafikî bike regez û naverokeke hişmendiyane bi armanca veguhestin, fêrkirin û belavkirina wê hişmendiyê, di nav civakê de. Roja pirtûkê ya cîhanî, di 23 Nîsanê de ye. Ev roj jî, roja wexerkirina W.Shakspear û Cervantes Saavedra ye. UNESCO di sala 1995an de li cîhanê kire biryar û ji wê rojê ve, tête pîrozkin. Lucius Annaeus Seneca, ko navê kiribûn Seneca yê genc (\*1 P.z li qurtuba; † 65 P.Z. li nêzîkî Rom), yek ji wan Philosoph, Dramatoger û lêkolînerê suruştê yê Roma bû, li ser pirtûkê weha digot: „Dema herî pir ko ez derbas dikim, ew danûstendina di gel pirtûkên min e“.

## Pirtûk

Şiyana Pirtûkê heye

Bipeyive

Bigirnije

Çavbigirî be

Xewnan bibîne

Geştê bike

Esseh carekê dê

Mirov pêdivî

Pirtûkekê bibe

Dako di gel


Bipeyive

Bigirî

Bikene

Xewnan bibîne û bikaribe

Geştekê bike



Pir nivîskaran behsa pirtûk û xwendinê kirine û li ser nivîsîne. Xaleke pir giring hevbeş e di navbera wan nivîskaran de, ew jî giringiya pirtûk û rola wê ya pozitîv e.

## Pirtûkek

Ez pirtûkekê dikrim

Ew li vir nexşeya min e

Pirtûkê dixwênim

Ew niha di hundurê min de ye

Tu pirtûkê dixwînî

Niha di hundurê te de

Ji ez û tu

Pirtûk

**Xwendin** stûnekî sereke ye, ji veguhestina nûçe, zanebûn û serpêhatiyan di navbera du mirovan de ye, ku pir hêlén jiyanê diyar dike. **Xwendin** proseseke nivîskî ye, information û ramanan bo têgehiştinê werdigire û dide. Li vir gotineke Josef Addison (1672-1719) xwe li bîra min dide: „**Xwendin** bo mejî, mîna Gimnastik bo gewd e ye“. **Xwendin** bi xwe huner e û hunera xwendinê jî ew çavxistina nav kaxezên pirtûkê ye, û tişa nediyar, an jî diyar derxistin e, dako mirov çêjekê, û sûdeyekê jê werbigire.

Wateya kultûrî ya xwendinê di pêvajoya dîrokê de hatiye guhertin. Di qonaxêñ kevin de, xwendin Luksus bû, tenê maldar û malmezinan di civatê de, ev proses pêk tîna û pirranya jinan jê bêpar bûn û derfet bo wan nebû. Lê îro roj di civaka pîsesaz de, **xwendin** proseseke pirr giring e û bê **xwendin**, civak nikare gavekê ber bi pêş ve biçe. **Xwendin** di her hêla jiyanê de pêdivî ye: Planên bûsan, Buhayên xwarin û pêdiviyên mirovan, kontraktên xaniyan..ev çend nimûne ne. Mirovê Analfebet be, dê pirr zehmetî û zorê bikêşe, ta kar û erkekî xwe bi ich bîne. Hêza xwendinê mîna karîn û hêza bingehîn e, dako mirov bikaribe bîr û behwerî û serhatiyên mirov û jiyanê jî hev cuda bike û sûdê ji wan werbigire. Pêdivî ye, zarok hîn ji biçûkatî ve fêrî xwendinê bibin. Yek ji aspektên giring yên xwendinê vepejin e (Reflexion), ko di vir de, dialog peyda dibe û qonaxa livê ya yekem dest pê dike.

**Xwendin**, rêya berbi zanebûnê ve ye. Di rêka xwendinê de, mirov zaniyariyên tiyôrî peyda dike û pişt re dikare wan tiyoryan li dar bixe.

**Xwendin** nebe kes naçe pêş peyda dîbin pirr derd û êş“  
Cegerxwîn

Bi van herdû regezan ve, jiyan û serpêhatiya pêşkeftina cîhanê girêdayî ye. Mirovê bêpirtûk, di pêpelûka herî jêr ya nezaniyê de ye û ew civaka nexwendewar, nikare bi pêş bikeve, neşê zatê xwe nas bike, ne jî şiyana wî bo bidestxistina viyana pêşvebirinê heye. Bi kurtî civakek bêhêvî û bêpaşeroj e. Peyveke Islandiyan heye, dibêje „baştir e, tu pêxwas bî, lê ne bêpirtûk. Ji bo **xwendin** di nav civatê de belav bibe, ji bo ko mirovên me, bibin xwedî zaniyarî û bîr û behwerî, pirtûk pêdivî ye, lê di behweriya min de, ta wêjeya pirtûkxanê derbasî nav civaka me nebe û nebe diyarok, mirov nikare hêviyekê ji civakê bike. Pirtûkxan e, hişê civakê ye û saziya herî giring, bi nerx û giring e, ku rêvebiriya zanistiya mirovahiyê dike.

Bi xwendinê asoyêñ xwêner berfereh dibe, nirxên ciwanî, hunerî û zanînê yên deqî jî bêhtir diyar û eşkere dîbin. Xwendina bi rîbaz, rî li ber xwêner vedike, dako şop û şûnên zanebûnê bêne naskirin, her weha, me ber bi têgeh û diyarokên din ve dibe:

1. Xwêner û deq
2. Ragehandin û kartêkirin
3. Hunerî û estatîk(Ciwanî, Spehîtayî, bedewî)
4. biyava ciwaniyê
5. şirovekirin û vepirsîn
6. Asoyêñ cuda yên deq û pirs û vekirina wî.



### \*Mahabad

Mehabad ...  
ev navê bi tîpê zêrînî  
hatî nivisandin  
û.. di sewdan de hatî kolan  
hatî qewartin  
Mehabad ...  
ferhenga şoreşê ye tu  
lêvegera jiyanê ye tu  
buhişa mirinê ye tu  
Mehabad...  
nayên jibîrkirin !  
Qadî -  
Mistefa –

û ewqas şehîdên din  
lê bera bi peyvê meydana  
“çar çura ...”  
Mehabad ...  
em jibîr nakin  
bîst û didwê çiryâ paşî  
hildana ala rengî  
sirûda ey reqîb  
lê bera xerabibe mala

Roj diçû ava..  
Tariyê perda xweyî reş  
Berdida ser riwê gerdûnê.  
Gund...Û...Bajar... Diketin xew  
Heyvê şerm dikir  
Piştâ xwe dida te..  
xatir nedixwest û diçû... Stêr direviyan..  
Dilên evîndarên te xemgîn dikirin û .. ew jî diçûn.  
Amûdê.....keleha êş û xeman  
Tu bi tenê şiyar dima  
Li ser masa derdên xwe... Te şîva evîndar  
Leheng ... û Can fidayêن xwe...  
Amade dikir û digel barçemokan,  
Te guliyên helbesta xweyî westiyayî dihûnand...  
Landika êşen te,  
Evîndarên te, giyanêن sotandî...  
Lehengêن te... Li aşiman...Firîsta dihejand  
Pêre sema dikirin û Dibin çengêن xwe de binaxkirin...  
**Amûdê...**

Birçiyê helbestê me.  
Bêriya zivistanêن teyî bi şîn dikim..  
Û fixanê bi axîn li kolanêن te...  
Cadeyêن teyî jibîrkirî,  
Tenûra nanê teyî germî sarbûyî,  
Dastanêن dînê teyî biaqil.... Hewar digot:  
-Xwedê nehêle...  
Wê ji kêre bîhêle, ji kêre nehêle... Şêxê doda li gola  
Enter...  
Mirîdên xwe dicivandin, li erbanê didan...  
Şermola dihejandin...  
Çîrokên binaxkirî vejîn dikirin... Ji xew şiyar dibûn.  
Çîrokan.. çîrok ji hevre digotin...  
Mindalêن ku zû ji himbêza dayikên xwe koçber bûn..  
Bi refen çûkan re , Bi fîrîşteyan re..  
Dojeh dixemilandin..  
Qedere min bi ya te ve girêdayî ye...  
Qedereke nepen... Dara jiyanê ji mêt ve..  
pela te hilweşandiye.  
Rewşa te awarteye,  
dayika min, evîna min....  
Ta kengî di payîzê de, dibin pelên hilweşyayî de..  
Bê dengiya xwe veşêre.....  
Li ser şêlakê.. herdem navê te.. dinîvisînim....  
Lê pêlîen derya hiltîne...  
Karwanê omîdê..  
Te li pişt xwe dihêle.  
Gerdelûlê ..giyanê te dilerizand...  
Tu germ î..sar nabî.....  
Hevîrên xwe li tenûra te dixistin..  
Te dipêça.. Li şoressêran belav dikir..  
Şoreşa hebûnê..  
Bi te berdewam dibû...  
Şahrezad .. Dilpakiya te bû... Toş..  
Welatparêziya te bû... Herifandina... keleha zordariyê,  
Awirek ji awirê tolê bû..  
Ax, ax, ax... Amûdê...  
Nema dikarim, li hêviya wê rojê bimînim  
Ez ê bimrim....  
Giyânê min bi axa te şâ bibe,  
Min pir ji te hezki...  
Amûdê.... Dayika min evîna min...

### Dilê Welatê min

#### Jiyan û mirina seranser

Xwarin

silavan li zikê westayî nake, û  
Hoşînî  
li gemiya xeman siwar nabe û  
Rondik  
dilopêن xwe yên dijwar di çavêن  
bêhêviyê de diçînin û metirsiya xwe ji  
bawermendiyê re ekere dike

Nizanim

Çima çav û gavêن min ji şopandina gemiya  
?bê ojdaniya nexêrxwazan tobe nakin

!Welatê min

Ez jiyanâ bê giyan qebûl nakim, û mirina  
bê jiyan jî ez qebûl nakim, lewra pêwîste  
tu min fêrî rê û pêkêن van herdû rengêن jiyanê  
:bikî

Jiyanâ bi can û cendek, û mirina bi giyan û henas  
Wisa ezê bizanibim kû hêjaye ez li dinê bijîm weko  
mirovek jîndar û ezê bi rengek rast û dirust cudabûnê  
.di nav bera kesan de û hemî rengan de diyar bikim

Narîn Omer



## Xwîn

Şaneyên xwînê yên sor (erîtrosit)

Xwîn an xûn , av an şilek e ron e ku gelek girîng e di jiyanâ laşen mirov û candaran e.Bi rastî, ew ava jiyanê ye. Di bedena mirovekî mest û gîhîştî da, bi giraniya xwe 70 kg û bi bejna xwe 170 cm, nêzîkî 56- litre xwîn hene.

Xwîn, silaveke ji gelek elementan pêk tê. Di nav xwînê da li aliyek şaneyên xwînê û li aliyê din da plazma bi tevî proteîn, rûn, karbonhidrat, madeyên mîneral, wek kalsiyûm, potasiyûm, natriyûm û hesin hene. Ew element tevî xwînê digihejin hemû derêن bedenê û her şaneyâ bedenê.


Di xwînê da sê cins şane hene. Ji wan re dibêjin erîtrosit (şaneyên sor yên xwînê), lekosit (şaneyên spî yên xwîne) û trombosit (şaneyên biçûk, yên ji bo meyandina xwînê; ger ew tunebin, xwîn nikare bimeye). Erîtrosit (sorgîlorik) ji pişikê oksijen bar dike u digihijîne her şaneyên

bedenê. Erîtrosit wekî şaneyên bedenê din nîn in, ji ber ku dendikê wan tune. Ew bi teqrîbî 5.000.000 / mîkrolître di bedenê da têr dîtin. Lekosit (spîgîlorik) bedenê ji mîkroban û hemû tiştêن ku beden naxwaze paqij dike. Anglo ew leşkerêن bedenê ne. Ger mîkroban avêtin ser bedenê, da ku we nexweş bixin, lekosit wan mîkroban nas dikin û di wê gavê da dijî wan şerekî destpêk dikin.

Gelek cinsên lekositan em nas dikin. Hindek ji wan ji bo kuştina mîkroban, hindek ji bo naskirina mîkroban û hindek jî ji bo çêkirina antîkor (dijîbeden) berpirsiyar in. Ji wan re dibin lenfosit. Ji cinsekî din ê lekositan re ji dibêjin monosit. Monosit li kuderê mîkroban dibine, wan dixwe û bi wî awayî wan bêzerar dike. Ev bi teqrîbî 5.000 / mîkrolître di bedenê da têr dîtin. Şaneyên din ku di xwînê da hene, navê wan trombosit in. Wezêfeya wan meyandina xwînê ye. Ger trombosit tunebin (di bedenê mirovan da, li her dezîlître 200.000 hene) xwîn nikare bimeyî û xwîn biherike heta mirov mir. Ger mirov birîndar be, an ji ciyekî xwe jêbike, trombosit têne şûna birînê û demarêن ku jêbûye û



jêder : Wikipêdiya





Hebû carek ji caran, xêr û xweşî bibarin li hazır û guhdaran.

Hebû tunebû, keçeke biçük hebû. Herkesî pir ji vê keçikê hez dikir, lê hezkirina

dapîra wê ji ya herkesî zêdetir bû. Dapîre carcaran ji bo ku kêfa keçikê bîne, diyariyek dida wê.

Rojekê jî dapîre kumikeke sor da keçika biçük. Kumik wisa xweş li keçikê dihat ku wê êdî nexwest kumikeke din bide serê xwe. Ji ber wê yekê, navê Keça Kumsor lê danîn.

Rojekê diya wê ji Keça Kumsor re got:  
\* Keça min a delal, binêre min hinek fêkî, kilor û suseyek serbet amade kiriye.

Divê tu van bibî ji dapîra xwe re; ew nexweş ketiye û bêhal e. Ku tu van bibî, wê pir

kêfa wê were... Dema tu bikevî rê, pir biaqlı be û berê xwe nede aliyêñ din, ji riya rast

dernekeve! Û dema tu bigihîjî mala dapîre, ji bîr neke jê re bibêje "Roj baş" û dendorê  
jî tevlîhev neke.

\*\* Ez ê her tist wekî tu dixwazî bikim, dayê", got Keça Kumsor.

Piştî wê selik girt, xatir ji diya xwe xwest û ber bi mala pîrika xwe ve mesiya.

Mala pîrika Keça Kumsor di nav daristanê de bû û nîv saet dûrî gund bû.

Dema ku

Keça Kumsor gihîst daristanê, rastî gurekî hat. Lî belê wê nizanibû ku gur heywanekî  
xirab e û ew qet jê netirsîya.

--Roj baş Keça Kumsor, got gur.

--Roj baş Gur, got Keça Kumsor.

--Tu bi ku ve diçî wisa ?

--Ez diçim cem dapîra xwe.

--Di selika te de çi hene wisa?

--Fêkî, kilor û serbet hene. Ez ê wan bibim ji dapîra xwe re. Ew ê bi van pir bi qewet be.

--Dapîra te li ku derê rûdinê, Keça Kumsor ?

--Panzde deqe dûrî vê derê, li nav daristanê ye mala wê. Li binya malê devî hene û li kêleka wê jî sê darêñ keleman hene, tu zanî?

Gur devê xwe alast û ji xwe re got:  
"Mmm ! İro ji min re ziyafeteke baş û xweş dixuye. Lê divê pêşî ez herim pîre hal bikim, piştî jî vê ciwanikê." Û gur ji keçikê re got: --Keça Kumsor, ka li van kulîlkên xweşik binêre.



Tu çima qet li wan nanêrî? Tu qet li dengê civîkan jî guhdarî nakî. Binêre çiqas xwes distirin.

Wekî ku tu diçî dibistanê wisa zûzûka dimesî. Li vê daristanê her tist pir delal in ha!

Pistî wan gotinêñ gur, Keça Kumsor çavêñ xwe bastir vekirin û ji ber delaliya xwezayê devê wê vekirî ma. Pistre wê ji xwe re got: "Ku niha ez ji dapîra xwe re ji van kulîlkan berhev bikim, wê pir kêfa wê were. Çawa be hê pir zû ye."

Kumsor dest bi berhevkirina kulîlkan kir. Ü, her cara ku kulîlkek jêdikir, wê ji xwe re digot: "Ha li wî alî yeke delaltir jî heyê, Keça Kumsor her ku diçû zêdetir diket nav daristanê û ji riya mala pîrika xwe zêdetir bi dûr diket.

Gur jî bi vê fersendê bi bazdan, rasterast çû mala pîre. Ü çaxa ku ew gihîst ber derî, li derî da got: "Teq teq!

--Ew kî ye?

--Ez Keça Kumsor im, pîre. Min ji te re xwarin û serbet anîne.

--Zimanê derî biksîne, veke. Qet halê min tune ez rabim ser xwe. Gur zimanê derî kisand, vekir, û bêyi ku tistikî bibêje, çû xwe çeng kir avêt ser pîra belengaz û ew bi carekê de daqurtand. Piştî jî cilêñ pîre li xwe kir, serê xwe girêda, di nav nivîna pîre de xwe dirêj kir û lihêf kîsandserxe.

Di vê navberê de, piştî ku Kumsorê têra xwe kulîl berhev kirin, bi carekê dapîra wê ket bîra wê û dîsa berê xwe da riya malê. Lê dema ku Kumsorê gihîst malê, dît ku derî vekirî ye û feqîre pir şaş ma. Dema ku ket hundir jî, hundir jê re pir xerîb xuya kir. Wê ji xwe re got: "Himm, ez iro çiqas dikevîm gumanê ! Lê dîsa jî, wekî her tim ez pir kêfxweş im, ji ber ku li cem dapîra xwe me."

--Roj baş, pîre !

Lê tu bersiv nehat. Keçik nêzî nivînê bû û lihêf da alî. Dapîr di nav nivînê de dirêjkirî bû, ser û çavê xwe hemû girê dabû. Halê wê pir xerîb xuya dikir.

Keça Kumsor sas û metel jê pîrsî:

--Pîrê, guhêñ te çiqas mezin bûne !

Gur got: --Ji bo ku te bastir bibihîzim.

--Pîrê, çavêñ te çiqas mezin bûne !

Gur wisa got û ji nişka ve ji nav nivînan hilpekiya û Keça Kumsor bi carekê de daqurtand.

Piştî ku gur zikê xwe têr kir, xwe di nav cihê pîrê de dirêj kir û di xew de çû. Wî wisa zêde xwaribû ku êdî pifepip û xurexur pê ket.

Tam wê demê jî nêçîrvanek di ber mala pîrê re derbas dibû. Wî ji xwe re got:

"Hela hela, ev pîrê çiqas xurexur dike îro, ka ez herim binêrim gelo pêdiviya wê bi tiştekî heye!" Nêçîrvan ket hundir û dît ku gurek di nav nivîna pîrê de raketîye.

-- "Hey gurê pîs! Ji kengê ve bû ez li te digeriyan..." got nêçîrvan.

Wî tam xwe amade kir ku bi tifinga xwe guleyan berde gur, bi carekê hat bîra wî ku mumkun e gurê dilres û çavbirçî dapîra belengaz daqurtandibe û belkî mumkun be

ew wê xelas bike. Nêçîrvan gule berneda, lî rahist meqesekê û zikê gurê razayî qelisand, vekir. Dema ku zikê gur qelisî, nêçîrvan dît ku waye Keça Kumsor û dapîra

wê herdu jî tê de ne.

Keça Kumsor ji zikê gur derket û got:

--Ooy! Ez çiqas tirsîyam ! Zikê gur gelek tarî bû !

Piştî Keça Kumsor, dapîra wê jî zikê gur derket.

Gur hê jî di xew de bû. Nêçîrvan Keça Kumsor sand derve da ku çend kevirêñ mezin bîne. Keçik bi lez çû ji derive çend kevirêñ mezin berhev kirin anîn û hemû xistin zikê gur. Pistre nêçîrvan zikê gur dirût û gur ji niska ve ji xew siyar bû û xwest

ji wir bireve.

Lê kevir wisa giran wisa giran bûn ku gur nekarî bazde û li erdê ket got tereeeeppp û mir.

Edî dilê nêçîrvan, yê Keça Kumsor û dapîra wê rehet bû. Nêçîrvan çermê gur hungurand û bir mala xwe. Dapîre fêkî, kilor û serbeta ku Keça Kumsor jê re anîbûn

xwar, vexwar û bi ser xwe ve hat. Keça Kumsor jî ji xwe re fikirî got: "Ji iro û sün ve ez ê gotinêñ dayika xwe ji bîr nekim û ez ê bi ya wê bikim."

Çiroka me qedîya,  
xêr û xweşî li hazır û guhdaran bariya.



## البيئة ضحية الحروب



في النزاعات المسلحة والمحروقات هناك ضحية أساسية يتوجه لها القوة المحتلية و كذلك القوى السلمية والمدنية في معظم الحالات وهذه الضحية هي سبب الحياة وسبب البقاء وأحياناً يكون سبباً للحروب أيضاً فقد لعب دوراً في اندلاع الثورة السورية حسب بعض المختصين، هذه الضحية هي البيئة التي هي منبع الحياة أي الإنسان نفسه، عندما يحارب الإنسان أخيه الإنسان ويستخدم أسلحة فتاكة فإنه ي GAMER بالضحية باشمن ما في الوجود، إنها البيئة عزيزى القارئ، نعم يبدوا أنها لا تستحق الأهمام وسط الدمار والقتل ولكن أؤكد أنها هي مشكلتنا ومشكلتكم وما ستؤول إليه مستقبلكما ومستقبل أطفالنا وقومنا بعد تدميرها.


ففي الحروب أول هدف يكون للجيوش هي النفط ويكون الصراع عليه لتأمين الدعم المادي وتكييد الخسائر للطرف الآخر وما ينتج عن هذا الصراع هو حرق للأبار النفطية وكذلك تدمير الأنابيب النفطية، حيث حرق الآبار ينبع عنها انتشار ابخرة سامة تنتشر مع ريح وتكون سحب تهطل على أثراها أمطار حمضية كما رأينا في المدن القريبة من العراق في سوريا في حرب العراق كديريك وقامشلي وعامودا وغيرها حيث هطلت أمطار حمضية مصحوبة بزبالت فغيرت التربة الزراعية وأضرت بها كثيراً، حيث أثرت على المنتوج الزراعي وبالتالي أثر على الحالة الاقتصادية للمزارعين مما تدى مستوى المادي لبعض من الناس حيث انتشر الفقر بينهم فهاجروا إلى مدن أخرى كدمشق وحلب وحمص وغيرها طلباً للمرارة.

ومن آثار الضارة للحروب على البيئة والإنسان هو قلة أو انعدام الخدمات مما يؤدي إلى رمي النفايات في أماكن غير أماكنها المخصصة والتجمع لأيام أو أسابيع في الشوارع وتفسخها مما يؤدي إلى انتشار أمراض بين الناس وخاصة الأطفال كالكوليرا أو أمراض جلدية أو تنفسية، وكذلك تسرب هذه القمامنة الملوثة إلى جداول الأنهر الجوفية، بسبب تجمعها واهتمامها في أماكن قريبة من الآبار أو أماكن ذو مستوى مياه جوفية عالية نسبياً مما يؤدي إلى تلوث المياه الجوفية وإصابة السكان بالأمراض جراء شرب هذه المياه، كما لاحظنا في أعوام 2008 و 2009 تلوث أحد الآبار في مدينة القامشلي بسبب رمي البلدية القمامنة بمنطقة قريبة من أحد الآبار الرئيسية مما أدى إلى تسربها إلى هذا البئر حيث أصاب العديد من الناس بإعراض معيوية جراء التلوث الحاصل، وقد تدرك الأمر بعد ذلك بفضل نشطاء في مجال البيئة حيث سلطوا الضوء عليه وضغطوا حتى قامت السلطات باتخاذ الأجراءات ..

وفي النهاية أن موضوع الحرب وتأثيرها على البيئة والإنسان موضع كبير ولن يأخذ حقه في هذه المقالة ولكن ما هو المهم فيما يتعلق بتلك المشاعر السلبية هي مشاعر زائفة وغير حقيقة وهي مصطنعة من قبل الطرف المحارب الآخر لذلك ومعظم هذه التوقعات والأفكار التي يعتزم الإنسان في هذه الحالات لن تحدث أبداً، والشيء البشري والفرح أنه يمكن تجاوز هذه المشاعر يا الإيمان بقد مشرق والتفاؤل، فالغد بشكل مؤكد سيكون أفضل من هذه المرحلة، إنها مرحلة عابرة وسيكون بعدها مرحلة أخرى أفضل من سابقتها.

## القلق النفسي عند الأطفال

### كمراة أيو



**أولاً:** تعريف القلق النفسي : القلق النفسي هو حالة من التوتر المصروف بالخوف وتوقع الخطر في أي لحظة .

**ثانياً :**

**أنواع القلق النفسي :** هو القلق الذي ينبع عن متعاب خارجية ويزول بزوال السبب .

**2- غصاب القلق :** هو القلق الذي يرجع إلى الصراع النفسي ولا يزول بزوال السبب .

**3- القلق الثاني :** هو الذي يصاحب بعض الأمراض النفسية والجسمية .

**ثالثاً :**

**مظاهر القلق النفسي :** 1- تكرار البكاء وكثرة والاستمرار فيه فترة أطول مما ينظر

2- اضطراب النوم تنتابه نوبات فزع ليلي .

3- اضطرارات تناول الطعام وهضمها فتضلل شهية الطفل وقد يصاب بالإسهال أو القيء .

**رابعاً :** **أسباب القلق النفسي :**

1- التهديد المستمر للطفل : وذلك عن طريق سماعه التهديد الذي يوجه إليه بإسراف كلما أتى أمراً لا يرضي عنه الوالدان حيث أنهم يظلون أنهم يختصرون الطريق في تنشئته أطفالهم بالتهديد عن طريق ترددتهم العبارات التي تحمل معنى التهديد .

**مثال :** إذا فعلت كذا فلن أحبك أو سأرميك في الشارع فتكون النتيجة أن تمتلىء نفس الطفل بالخوف والانزعاج والقلق .

2- تكرار تعرض الطفل لواقف الخوف والخطر والقسوة والعنة فيصبح القلق والخوف من مكونات الشخصية .

3- إذا كان أحد الأبوين مصاباً بالقلق ، ينتقل القلق إلى الطفل نتيجة لتصرات الأم أو الأب المضطربة القلقية .

4- تعرض الطفل إلى الفشل المتكرر إذا تعرض الطفل صعوبات متكررة في الحياة أو فشل فشلاً متكبراً دون أن يجد من يساعدة أو يواجهه أو يشجعه كل هذا يؤدي إلى شعور الطفل بالقلق .

**خامساً :** **سبل الوقاية من القلق النفسي :**

1- إشباع حاجات الطفل من الرعاية والمحبة والاهتمام والشعور بالأمن والاطمئنان الذي هو حجر الزاوية في القضاء على المخاوف والقلق .

2- مساعدة الأطفال على فهم ما يحيط بهم من مواقف المشكلات التي تتطلب منهم حلأ

3- تشجيع الأطفال على أن يثقوا بأنفسهم وعلى أن يواجهوا مشكلات الحياة بشجاعة واقعية .

من خلال ما سبق نجد أن للبيئة المحيطة بالطفل وكيفية تعاملهم معه دور كبير وفعال في تكوين شخصية الطفل




# xeçerêz

## Rast

- 1 - bax - curek ji kanê buha .
- 2 - tersê hilat - namûs .
- 3 - paytexta iraqê .
- 4 - tê vexwarin (b) - tersê erê .
- 5 - di nav avê de dijî .
- 6 - şêwe - xiyar .
- 7 - xelata bûk û zave .
- 8 - rewan - tersê mîr .

## Serjêr

- 1 - Ziman - Dîmeşiq ( b ) .
- 2 - bo nîşana nêzîk - bê nemûn ( b ) .
- 3 - tersê dê ( b ) - çemeke li Kurdistanê .
- 4 - tersê bejî - tersê erê .
- 5 - tîpin ji xalhalok - yan .
- 6 - v.d.z belawela - tersê xemsar (b).
- 7 - komarka Asywî .
- 8 - kenaleka Kurdî - tersê kevin .



## همساتٌ مكانيةٌ

نغم اسماعيل

يامن يحنُ إلى دمشقَ وواديها قد دَعَتْ دمشقَ ومن فيها ارتسِمتْ بريشةً فنانٍ وابتهجتْ روابيَّها.. وهي جمالٌ في نواحيها وأعينٌ قاسِيونْ تبرق سحراً ناظرةً للشام .. دامَعَةً ماقِيَّها .. \*

بحَرْ إذا لاقى الشمْسَ أَشْرَقَ وان لقي القمرَ أَسْعَدَ يثُورُ في أعماقهْ غضباً "ليقذف هماً" فيه قد أَزْبَدا لاذْقِيَّتي \*

سكنَتْ فُؤَادِي من غير مبتدأ ووطَّأتْ عَقْلِي من غير خبرٍ واحتَلتْ كِيَانِي من غير فعلٍ وفي غزوها لا تعرِفُ الحَذَرَ فصرَتْ في أَرْجائِها فاعِلٌ مرفوعٌ بضمَّةِ أَطْفَالِ الْقَهْرِ وتميَّزَتْ عن ذَلِّ اسْمَ مجرورٍ بِحَرْفٍ يصْنَعُهُ أَنْفَهُ البَشَرِ.. فلنَّ أَكُونُ فِي ظلِّهَا مفْعُولٌ بِهِ وَلَا مَضَافٌ إِلَيْهِ عَلَى هَاوِيَّةِ الْعَمَرِ وَلَا صَفَّةٌ يَطْلُقُهَا كُلُّ خَائِنٍ جَبَارٌ عَلَى حَالٍ يَرْشِي لَهَا حَتَّى الْحَجَرِ ..

امسحُوا عن دمشقَ دموعَ السَّهَادِ والبسُوها ثوبَ الْعَفَّةِ والعتادِ أو اسلِبُوها حزناً مصلوبَ الْفُؤَادِ حتى لا تُقْيِدَ الْبَعْدَ فَإِذَا سالتْ دموعَ بِرَحْمَةِ العِبَادِ فَهُلْ تَلْبُونَ دُعَوةَ مَحِبٍ أو تحرِّروا قِيودَ الْبَعْدِ فإذا سالتْ دموعَ عِينَهَا فلنَّ تَعْلَمُوا ما هو الرَّادِ وإنْ نَادَتْ نَداءَ استغاثَةٍ فلنَّ يَقْدِمُ إِلَى الغَيْثِ لِتَلْبِيَّةِ النَّداءِ فَأَيْنَ شَعْبِيُّ وفَرْسَانِيُّ وجَنْوَديُّ؟ وَأَيْنَ ضَمِيرٌ يَعْشَقُهُ الرَّقَادُ وَأَيْنَ حَسَامٌ وَمَهْنَدٌ فِي زَمْنٍ لَا تُسْمِعُ فِيهِ حَتْنَ صَهْوَةِ الْجِيَادِ.. فَاكْسِرُوا قِيَديِّي مِنَ الظُّلْمِ لَأَرِيكُمْ دَهْرًا في العَدْلِ وَالْمَعْدِ ..



## Peyva wendayî

Peyva wendayî ji 9 tişa ye nave helbestvanê nemirî û dengdayî

- HAVÎNÊ
- DAD
- AWAZ
- BEG
- BÊTAR
- BEXT
- DEM
- HAT Ô ÇÛ
- MARDÎN
- BAC
- BÎN
- ARAM
- BÊKÊR
- AL
- BABET
- BUHA
- BERSAL

D	H	A	V	Î	N	Ê	G	D
A	H	A	T	Ü	Ç	Ü	R	E
D	Î	N	Î	D	R	A	M	M
A	R	A	M	E	B	U	H	A
B	E	R	S	A	L	N	A	L
B	Î	N	W	B	Ê	K	Ê	R
B	A	C	C	B	A	B	E	T
B	Ê	T	A	R	E	B	E	G
A	W	A	Z	X	B	E	X	T

\* PEYVA WENDAYÎ

--	--	--	--	--	--	--	--	--

- Erêni = إيجابي  
Neyini = سلبي  
şêwaz = أسلوب  
Rexne = نقد  
Destane = ملحمة

- Xweşbin = متفائل  
Reşbin = متشرّئ  
Gote got = اشاعة  
Perol = كلمة السر  
Rûnivîs = نسخة

- Erk = وظيفة - مهمة  
Pêdivî = حاجة  
Keysbazî = انتهازية  
Diyarok = منصب  
Diyarde = ظاهرة



ولات (ثقافية . عامة . مسلمة) . نصف شهرية